



Hercules-Herakles

Silêman Demîr
Silemand@yahoo.se

Herakles, yûnanî ye. Hercules, navê wî yê bi latînî ye. Li rojhilata navîn ji Herakles re Herkul dihê gotin. Di huner û edebiyata dinyê de bi piranî navê yûnanî heye. Herakles, niha bi navê Hercules li asîman sdihêrik e.

Herakles lawê Zeus û jinmîra Thebe, Alkmene ye, yek ji nîvxwedan e û egîdihê herî navdar ê seranserê dîrokê ye.

Dibêjin ku demekê mîrek li Mykene heye. Gelek şer bi mîrekiyên cîran re kirine û lawên wî hemû di şeran de hatine kuştin. Xwestina hilanîna heyfa wan dide dilê wî, dibe kuleke mezin, lê ew bi xwe nikare çi heyfan hilîne, mezin bûye û qels ketiye.

Rojekê dibêje "yê ku bê heyfa lawên min hilîne, ez ê keça xwe Alkmene û mîrekiya xwe tevî bidim wî". Wî çaxî mîrzayekî Thebeyî yê bi navê Amfîtryon derdikeve û dibêje ku ew ê here heyfa lawên wî hilîne û Alkmene dixwaze. Mîr, hema zû wê dide wî û wî dişîne şer, ser dijminên xwe. Carê nav û deng û biserketinên Amfîtryon dihên bihîstin û Alkmene pê serbilind dibe.

Lê heta gava Amfîtryon li şer e, Zeus ji asîman Alkmene dibîne û dilê wî dibije wê. Êvarekê di şiklê Amfîtryonê ku xwedêgiravî biserketî ji şer vedigere de, diçe ba wê û pê re radize. Alkmene, bi baweriya ku mêrê wê nû ji şer vegeriyaye, bi hezkirin û kêfxweşî xwe jê re radixe û xizmeteke nedîtî di nav nivînan de jê re dike.

Zeus gelekî memnûn dibe, naxwaze ku wext here û ew xweşî xelas bibe. Lê bi dû şevê de, sibeh û roj hene, ji nav nivîn derketin heye. Zeus naxwaze wilo bibe. Radibe wî çaxî fermanê dide lawê xwe Hermes da here royê bisekinîne, da ew şeva wilo xweş dirêj bibe. Hermes diçe wilo dike, diçe emrê wî digihîne Helîos û ew jî wek ku Zeus xwestiye dike. dihê gotin ku ew şev, wek sê şev û sê rojan direj dibe. Zeus wê şeva wek sê şev û sê rojan dirêj ji himbêza Alkmene dernakeve. Herakles ji tovê Zeus ê wê şevê çê dibe.

Lê dihê gotin gava ku dibe sibeh û Zeus nû ji ba Alkmene diçe, îcarê

mêrê wê yê rast ji şer vedigere û dihê malê. Mêrê wê Amfîtryon wê li ser nivînên wê, di halê ku nû yek ji ber wê derketiye de dibîne. dihê derdixe ku yekî din wê şevê mêvanê wê ye. Lê Alkmene tiştekî venaşêre û dibêje ku ew bi xwe ye yê ku ji êvarê ve li ba wê ye, yê ku wê xwe bi merdî jê re raxistiye. Tasa ku wî wek diyarî daye wê, pêş wî dike. Amfîtryon şaş û har dibe û dibêje "na, ne ez im". Radibe tasê digire û rast diçe ba Tîresîasê remildar. Tîresîas dinere û zû dihê derdixe ku Zeus bi xwe ye yê ku hatiye û bûye mêvanê Alkmene û wilo ji Amfîtryon re dibêje, Amfîtryon aş dibe, serbilind dibe û dipesine ku yekî wilo mezin hatiye û ji bedêla wî vê bûye mêvanê Alkmene û vedigere ba wê. Kêfxweşiya xwe ji bo hatina mêvanê ezîz diyar dike û wê pîroz dike.

Ew jî êvarê bi Alkmene re radize. Tovê wî jî dikeve nava wê û wê êvarê ji wî jî avis dibe. Wê Alkmene cêwî bîne, yek ji Zeus, yek jî ji Amfîtryon. Bi dû re navên Herakles û Hîfîkles li wan dikin. Herakles ji Zeus, Hîfîkles jî ji Amfîtryon.

Amfîtryon vedigere weladihê xwe Thebe û li wir mîr e.

Zeus, roj û wexdihê ku wê Herakles çê bibe, ji bîra nake. Dixwaze gava çê bibe, wî xelat bike, pê serbilind bibe û bipesine. Heşkere dike ku ew ê gelek xelatan bide wî û bi dû re jî bike ne serokê mirovan tenê, ew ê wî bike mezinê hemû zarokên xwedayan jî. Jina wî Hera ku jinmîra gerdûnê tevî ye, gelekî ji wê gotina wî aciz dibe. Jê dixwaze ku ew bi çemê styx sûnd bixwe da tişdihên ku gotiye bike, ji bo ku ew bi xwe jî here ber wî xerab bike û felekan li serê wî bigerîne. Zeus wilo sûnd dixwe û Hera jî wilo dibe dijmina Herakles a li hemû deran.

Gava Alkmene dikeve ber pîrikan, Zeus xeladihên xwe diyarî lawê ku wê li wê qesrê, yanî Qesra Thebe çê bibe, dike.

Hera, wê êvarê keça xwe ya pîrik Ilythia, zû dişîne qesra Thebe. Ilythia li wir wek pîreke perixî di devê derî de rûdinê û qolinc û çêbûna zaroka Alkmene dereng dixe. Heta wilo, Hera diçe jinbira wê, Nîkîppe, ku jina Sthenelos e û di hêleke qesrê de ye, dike ber pîrikan. Di heqîqeta xwe de, zikê Nîkîppe hîna heft mehî ye. Lê Nîkîppe dîsa jî wê êvarê lawekî tîne û navê wî dikin Eurystheus. Sozên ku Zeus ji bo lawê xwe dide, xeladihên ku jê re amade kirine, dibin para wî. Ji ber ku ew wê êvarê çê dibe. Lê her çi Alkmene ye, hîna di ber pîrikan de ye. Rojek bi ser wexdihê wê dikeve. Cêriya wê Galanthîs dihê derdixe ku beleyeke wê heye û hebe nebe ji wê pîra devê derî ye. Diçe berdide wê û bi çûna wê re Alkmene du lawan tîne. Yek jê Herakles e, lawê Zeus e û ê din jî Hîfîkles e, lawê

Amfîtryon e. Herakles bê xelat û par dimîne, herdu bi hev re dibin bes xwediyên qederên mirovan tenê. Hera, ji kirina Galanthîs gelekî aciz dibe, hema wê bîstikê wê dike pisîkek û berdide rasdihê.

Xeladihên ku Zeus ji bo Herakles difikire, nabin para wî. Lê Zeus zû pê dihise û wî ji nû ve xelat dike: Egîtî, spehîbûn, hişmendî, bîrewerî, edalet, cesaret û qeweta zend û bendan, li ba Zeus bêdawî ne, dihêra Herakles ji wan dide wî. Bi qasî ku çi kes pê nikaribin qewedihê dide wî. Hin dibêjin ku qeweta hezar zilamî diyarî wî dike û dixe bedena wî. Her wilo wî dike nîvxweda.

Herakles zû mezin dibe û gava mezintir dibe, spehîtir jî dibe. Nîşanên xwedatiyê lê xuya dikin. Hera ji Herakles dienitîne û dijmanatiya wî dike, ber wî xerab dike û felekan tîne serê wî. Hîna gava Herakles di dergûşê de ye, hîna gava heşt mehî ye, Hera rojekê du marên mezin dişîne da herin pê vedin. Hîfîkles bi dîtina maran diqutife û digirî, lê Herakles hîna di wî emrê biçûk de wilo xurt e, bi qewet e û cesaret e ku, diçe herdu maran bi desdihên xwe dixeniqîne.

Gava Herakles dibe xort, dibe xortekî dirêj, spehî, girs, sivik, bi aqil, bi cesaret û bi edalet û dilovan. Ew ji rêyan, rêya Başiyê hildibijêre.

Gava Herakles mezin dibe, dibe zilamê dinyê yê herî girs, bi qewet, bi ceger û jêhatî. Her wilo ew gelekî hişmend e. Li ber desdihê mamosdihên herî baş perwerde dibe û kentaurê nemir Chîronê (Chîron, ji navikê pê ve hesp e) ku mamosteyê piraniya egîdihên wê demê ye, mamosteya wî jî dike. Chîron wî fêrî hemû tiştan dike. Êdî tu kes û tişdihên ku bi wan nikare, tune ne. Dikare hemû tiştan bike. Hemû tişdihên ku mirovan wî çaxî dixwestin bikin, lê nikarîbûn bikin, Herakles dike. Ji ber wê yekê jî nav û dengê wî li dinya ku wî çaxî dihê naskirin tevî belav dibe.

Gava jahrî dibe û dike bimire, bavê wî Zeus wî dibe ba xwe Olympê û wî dike xweda û keça xwe Hebe dide wî.

Herakles wek komeke sdihêrik bi navê Hercules li bakurê asîman e. Gava mirov li Hirça Mezin binere, bi dû re hinekî li hêla çepê li jor binere, xuya dikin. Çend stêrikên ku bi çavan xuya dikin û wêneyê zilamekî ku herdu milên xwe bilind kirine. Di rastiyê de komên mezin ên stêrikên cuda ne. Hin ji wan bi hezaran in û gelekî dûrî me ne. Koma herî nas û navdar koma M13 ye, 22 000 salên ronahiyê dûrî me ye û 160 salên ronahiyê bo tîreya bazinî fireh e. Koma M92, 35 000 salên ronahiyê dûrî me ye. Di nav stêrikên yek de, Beta (Kornephoros) û Zeta (Rutilicus) xweş xuya dikin. Alfa Herculis jî gelekî mezin e û sor e, ew girseke super a sor e.